hejmar 2 zivistan 1988

KURMANCÎ

rojnameya taybetî ya Enstîtuya kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravê kurmancî

Min ev nivîsî ne ji bo sahibrewacan
Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan

Ehmedê Xanî
(Sedsala XVII)

BARSELONA 2

Nivîskar, rojnamevan û zimannasên kurd ên dervayî welêt salê du caran, di bihar û payîzê de, ji bo hefteyekê dicivin, li ser pirsên rastnivîsîn û nûkirina kurmancî dixebitin.

Di civîna bihara 1987 an de giraniya xebatê li ser peyivnasiya (terminoloijiya) coxrafî û li ser rastnivîsîna navên rojan, mehan û hejmaran bû. Navên welatên cihanê, ên çiya, deşt, çem û bajarên sereke, bi zimanê kurmancî hatin tesbît kirin. Encamên civînê di hejmara 1a rojnameya taybetî ya Enstîtuya kurdî *Kurmancî* de hatin belav kirin. Ji ber van encaman nexşeyeke (xarîteyeke) rengîn a cihanê bi zaravayê kurmancî hate pêk anîn û çap kirin.

Civîna payizê ji 7 ta 14 teşrîn 1987an de dîsa li bajarê Barselonayê (paytexta Katalonyayê), bi arîkariya dostane ya hikûmeta otonom a katalanî çê bû. Di civînê de ji rojhelat ta rojava, ji bakur ta başûrê navçeyên kurmancîaxêvên Kurdistanê çibigre ji her herêmê beşdar hebûn. Di rojên pêşîn ên civînê li ser navên coxrafî yên Kurdistanê hate xebitîn. Di şêst salên dawîn de dewletên ku welatê me li hev par kirine navên piraniya bajar, bajarok, deşt û çiyayên me jî guherîne, navên nû li van danîne. Guhartina navan destpêka guhartina zanava (huwiyeta) kesekî, gelekî an welatekî ye. Lewra gava ku Konkîstador ên spanî an dagîrkerên brîtanî an îngilîz welatek zevt dikirin tafil navên nû li wan datanîn û, piştî çend nifşan (neslan), derveyî çend zana û dîroknasan, kesî êdî navên kevn ên van welatan nedizanî.

Di sedsala XX an de li me jî wilo qewimiye. Welatê me ji me re bûye biyanî (xerîb). Em Kurdên Îran û Iraqê li aliyekî bihêlin, îro çend Kurdên Tirkiyê dizanin ku navê kurdî yê *Adiyamanê* Semsûr e, ku yê *Kurtalanê* Misric e, *Bingol, Çewlik e...*

Ji bo ku ev nav neyên ji bîr kirin, nifşên nû ew binasin, Enstitu ji ber encamên vê civîna payizê xarîteyeke rengîn a Kurdistanê da çap kirin, tê de navên kevn ên bajar, bajarok, çem, gol, deşt û çiyayên Welatê Kurdan bi awayekî zanistî bi cî kir û li bin navan, di nav kevanekan de, navên wan ên resmî jî nivîsî da ku welatiyên me çêtir tê bigihên. Weka her xebata destpêkî ev xarîta jî bê kêmasî û şaşî nîne. Ewê di çapa duwemîn de bên rast kirin.

Di bernameya Civîna payizê de hin pirsên din jî hebûn: navên îdarî, navên meywe û heşînatiyan, reng, hwd... Bi carekê bersîvdana pirsên wilo freh mimkin nebû. Pirsên ku hatine safî kirin di vê hejmara Kurmancî de tên belav kirin. Ên din ewê gav bi gav, piştî şêwr û lêgerînên bêtir, di civînên pêşiya me de zelal bibin. Herwekî di encamên vê Civînê de jî dixuye amanca vê xebatê çêkirina peyv û gotinên nû nîne. Heya ku ji me tê, em lê digerin ka li navçeyên cihê yên Kurdistanê ji bo tiştekî çi nav bêtir tê bi kar anîn. Em wî navî û, heke ku hebin, guhartoyên (variyantên) wî yên deverî tesbît dikin û belav dikin. Gava ku di tu zaravê kurdî de ji bo tiştekî an mefhûmekê navek nîn be, wê demê li ser çêkirina peyveke nû, li gora aheng û mantiqa kurmancî, diponijin. Baş di bîra me de ye ku zimanekî çêkirox, zêde *xwerû û petî* heye ku dilê hin ronakbîr û xwendayan xweş bike lê piraniya xelkê tê nagihê, xelkê ji hevûdu û ji xwendayan dûr dixe. Gava ku Kurdekî ji rêzê, hinek bi xwendin û nivîsandinê dizane, bikaribe bi serbestî, bi zimanê xwe yê rojane, kovar an romaneke kurdî bixwîne û jê zewq bistîne emê bikaribin bêjin ku kurmancî êdî bi rastî bû, an cardin bû zimanekî nivîskî yê gelêrî. Zimanê ku bi frehî hate nivîsandin û xwendin jî êdî zû bi zû winda nabe. Amanc û merema xebata me jî her ev e.

KURMANCÎ

ENCAMÊN CIVîNA PAYÎZÊ

Nivîskar, rojnamevan û zimannasên kurd ên ku ji 7 ta 14ê teşrîna 1987an li barjarê Barselonayê li ser pirsên rastnivîsîna kurmancî xebitîn, gihane encamên (netîceyên) ku em di rûpelên vê rojnameya taybetî de belav dikin.

RENG

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
spî	beyaz	blanc	white
reş	kara	noir	black
sor	kırmızı	rouge	red
zer	sarı	jaune	yellow
kesk, sewz	yeşil	vert	green
şîn	mavi	bleu	blue
qehweyî	kahverengi	marron	brown
qemer	yağız	basané	swarthy
qemerê vekirî, esmer	esmer	brun	dusky
gewr, spiyê girtî	açık gri, açık	clair, gris clair	light, light grey
qerqas, çil spî	bembeyaz	blanc éclatant	bright white
binevşî, mor	mor	violet	purple
pembe	pembe	rose	pink
erxewanî	şarabrengi	pourpre	crimson
kej	kumral, sarışın	blond	blond, fair
bor	kızıl	roux	red-haired, redhead
boz	boz	gris-pommelé	dapple-grey
çûr	açık sarı	jaune clair	light yellow
qîçik	saman sarısı	jaune paille	straw colour
qer	parlak siyah	noir brillant	bright black
şê (qehweyê bi sorayî ve)	al (at için)	alezan	chestnut
genimî	açık esmer	couleur de blé	wheat colour
şîrî	sütbeyaz	opalin, laiteux	opaline
xakî	haki	kaki	khaki

MEYWE

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
sêv	elma	pomme	apple
porteqal	portakal	orange	orange
hirmê	armut	poire	pear
hêjîr	incir	figue	fig
hinar	nar	grenade	pomegranate
zebeş, şûtî	karpuz	pastèque	watermelon
xox	seftali	pêche	peach

tirî	üzüm	raisin	grapes
kelek,gundor, petêx, qawin, qire	kavun	melon	melon
arûng, zerdele, qeysî, mişmiş	kaysı	abricot	apricot
tûtfrengî	çilek	fraise	strawberry
tû	dut	mûre	blackberry
behîv	badem	amende	almond
gûz	ceviz	noix	walnut
gêlaz, qeresî	kiraz	cerise	cherry
wîşne	vişne	griotte	morello cherry
biyok, bih	ayva	coing	quince
alûçe	yeşil erik	mirabelle	green plum
încas, hulûreş	kara erik	prune	blak plum
lîmon	limon	citron	lemon
mûz	muz	banane	banana
mandarîn, klementîn	mandalin	mandarine, clémentine	mandarin, clémentine
fistiq, piste	fıstık	pistache	pistachio
findiq, bindeq	fındık	noisette	hazelnut
bitim	bıtım	lentisque	
kezwan, şînok	menengüç	térébinthe	
givîj	akdiken	aubépine	hawthorn
xurme, qesp	hurma	datte	date
hembelaz, xatûnok			
dendûreşk	böğürlten	mûre sauvage	bramble
ananas	ananas	ananas	pine apple
şekok, girsik	ahlat	poire sauvage	wild pear
tihok, tawik	dağdağan	baie de sureau	elderberry
belût	palamut	gland	acorn
kestane	kestane	chataîgne	chestnut
tereqî	nektarin	nectarine	nectarin
zeytûn	zeytin	olive	olive

HÊŞÎNAHÎ - S E W Z Î

kurdî	*tirkî*	*fransizî*	*îngilîzî*
pîvaz	soğan	oignon	onion
sîr	sarmısak	ail	garlic
pîvazterk	yeşil soğan	oignon	shullot
xiyar, arû	salatalık	concombre	cucumber
bejik	kıtır	variété de concombre	variety of cucumber
acûr	acur	conbombre russe	russian cucumber
îsot	biber	poivron	green
kelem	lahana	chou	pepper
gulkelem	karnıbahar	chou-fleur	cabbage
kelemê Brukselê	Brüksel lahanası	chou deBruxelles	cauliflower
			Brussels sprout
sorkelem	kızıl lahana	chou rouge	red cabbage
kartol, patat, qompîr	patates	pommes de terre	potato
sêvaxîn	yerelması	topinambour	helianthe tuberaux
xes	marul	laitue	lettuce
gizêr	havuç	carotte	carrot
pirasa	pırasa	poireau	leek
şiwît	dereotu	fenouil	fennel
bexdenûs	maydanoz	persil	parsley
firingî, şamik, bacanê sor, temate	domates	tomate	tomato
balican, bacan	pathcan	aubergine	aubergine,eggplant
fasûlye, lobî, lobye	fasulya	haricot	bean
nok	nohut	pois-chiche	chickpea
nîsk	mercimek	lentille	lentil
maş	börülce	féerole, faséol	horse bean
baqil	bakla	fève	broad bean
tevrik, tivir	turp	radis	radish
binerdik	şalgamın bir türü	variété de navet	variety of turnip
şêlim	şalgam	navet	turnip
silk	pancar	betterave	beet
silka sor	kırmızı pancar	betterave rouge	beetroot
silkên şekir	şeker pancarı	betterave sucrière	sugar beet
kundir, kulind	kabak	courge	marrow, pumpkin
dolmik, rextik	kabak	courgette	courgette
bamiye	bamya	gambo, bamias	okra, gumbo
engînar, neynokên bûkê	enginar	artichaut	artichoke
xerdel	hardal	moutarde	mustard
meroje, kiling	kuş konmaz	asperge	asparagus
garis	darı	millet	millet
lazût, gilgilê Stembolê, garisê Stembolê, genimê Şamê, genimok	mısır	maïs	Indian corn, corn
rêwas, rûbês	ravent, okçul	rhubarbe	rhubarb
îspanax, silqok, siyele	ispanak	épinard	spinach
karî, kuvark, kumik, figerojşk, karkulîlk			
karok	mantar	champignon	mushroom
tûzik	tere	cresson	watercress
tolik	ebegümeci	mauve	mallow
rihan	fesleğen	basilic	basil
pûng	yarpuz	menthe sauvage	spearmint
kereng	kenger	chardonnette	cardoon
nane, pûjan	nane	nane	mint
catirî	kekik	marjolaine	marjoram
sîrik	yabani sarmısak	ciboule	scallion
sîrim		ciboulette	chive

PEYVEN KURDÎ DI KLASÎKÊN ME DE
Mewlûda Kurmancî

Reşo ZÎLAN

Mewlûda Kurmancî ya ku em ê lê piçekî hûr binihêrin û hin peyvên kurdî yên ku tê de derbas dibin, berpêşî we bikin, ya Mela Huseynê Bateyî ye. Ji bilî mewlûdnameya Bateyî, Mela Ebdilkerîm Mideris û Mih-emede Reşad El-Miftî ji mewlûdname nivîsandine. Di nav van herdukan de mewlûdname ya El-Miftî bêtir nêzîkî ya Bateyî ye. Di van salên dawin de, melayek ji melayên Kurdistana bakur, mewlûdnameya Bateyî li gor zanîn û kurdiya xwe, bêî ku kêşa wê ya yazdeh kîteyî têk bide, kiriye kurmanciyeke nû. Di van hiç

yekê de tam û çêja rastîn ya mewlûdnameya BATEYÎ dîtin ne mumkun e. Mewlûdnameya Bateyî, bê guman ji hemûyan têkûztir, edebîtir, giranbihatir û binavûdengtir e. Ev di nav şêniyên Kurdistanê de, yên ku bi zaravayê kurmancî dipeyivin, gelekî belav bûye û nas e. Mirov bê şik dikare bibêje, ku di nav klasîkên kurdî de ya herî bêtir çap û belav bûye, nas e û tête xwendin, Mewlûda Kurmancî ye. Dêlindêzên xwendin û dayîna mewlûdan êdî ji roleke olî û ayinî bêtir, roleke civakî dilîzin. Ew gelek caran ji bo bîranîna miriyan, pîrozkirina di tistekî de biserketinê, bi sax û xwe,sî ji xerîbî û eskeriyê vegerê û herweha ji bo belavkirina xêr û qenciyê û hwd. tête xwendin û dayîn.

Gelo Mala Huseynê Bateyî kî ye û çi kes e ? Çi berhem û afirandinên wî hene ? Herçendî ev pirs ne babeta vê nivîsarê be jî, dîsan jî pêwîst e ku em gelekî bi kurtî li ser van pirsan rabiwestin.

Gelek kesên ku li ser BATEYÎ û mewlûdnameya wî nivîsandine; Bilîç Serko, M.Emin Zekî, 'Elaeddîn Sucadî, Herekol Azîzan, Prof. Qanatê Kurdo, Dr. Kemal Fûad, E.B. Soane, Thomas Bois, V.F. Mînorsky û gelekên din, bêî ku bi belge bipeyîtînin, dibêjin navê wî "Mela Ehmedê Bateyî" ye. Lê heçî navê "Ehmed" e, wî hiç li cîhekî û li hîç helbestekê bi kar neaniye welê xûya dike ku çavkaniya vî navî, A. Jaba ye. Herwekî têtê zanîn A. Jaba, balyozê Rûsyayê li Erziromê, hemû agehî û enformasyonên xwe yên li ser klasîkên kurdî û nivîsevanên wan ji Mela Mehmûdê Beyazidî wergirtiye. Mixabin gelek ji wan jî şaş in. Wisan diyar e, ku cara pêşîn ev nav bi şaşî bi riya pirtûka A. Jaba belav bûye û yên din jî jê û ji hev wergirtine. Di çapeke Stembolê û her weha di çapa Gîw Mukriyanî ya Mewlûda Kurmancî de navê wî "Hesen" hatiye nivisîn, ku ev jî ne rast e. Lê navê rastî yê xwedî û nivisevanê Mewlûda Kurmancî, her wek neviyên wî bi xwe jî dibêjin û di nav mela, feqî û şêniyên Kurdistanê de belav e û di pişta mewlûdnameya wî de jî hatiye nivîsîn, Mela Huseynê Bateyî ye. Ew bi xwe ji eşîra Hertoşîyan (Ertroşiyan) e û ji gundê Bateyî ye. Ev gund li herêma Hekariyan e û dikeve nêzîkî geliyê Tiyarê û gundê Marûnis.

Têtê texmîn kirin, ku wî di medreseya Mîr Hesenê Welî de, li gundê Muksê xwendiye. Ev medrese, medresa mezin û binavûdeng e. Dibêjin carina heya 300 feqeh lê dixwendin û qasî 10 mamosteyan jî tê de ders didan. Wî piştî dawîanîna xwendina xwe ya medresê, bi xwe ders dane feqihan. Ew bi zanist û nivîsîna helbestan ve mijûl bûye. Herweha çûye hec û helbesta xwe ya "Hilo raba Ebû el-Qasim" li ser gora pêxember gotiye.

Heçî zanîna dem û zemanê ku ew tê de jiyaye, yek car dijwartir e. Gelek kesan, wek A. Jaba, B. ∑erko, M.E. Zekî, 'E. Sucadî, H. Azîzan, Prof. Q. Kurdo, T. Bois, V.F. Mînorsky û gelekên din gotine ku ew di navbera salên 820-900-ê koçî, ango 1417-1495-ê zayînî de jiyaye. SADIQ Behadin Amêdî, Bateyî hevçaxê Mela Mensûrê Gêrgaşî nîşan dide. Mela Mensûrê Gêrgaşî ji gundê Gêrgaşê ye. Ev gund dikeve başûra rojhelata Amêdiyê. Mela Enwerê Mayî dibêje ku "Ew di sedsala 11-an ya koçî de jiyaye, ango di sedsala 17-an ya zayînî. Lê herwekî mewlûdname ji aliyê olperestî û dîndariyê de afirandineke gelekî girîng e û cihê wê di dêlindêzên ayînî de bi qedr û rûmet e, ji aliyê kesekî wek Ehmedê Xanî (1650-1707) de nenasbûna wê pirseke girîng tîne pêşberî me. Heke hebûna wê ji aliyê Xanî ve bihata zanîn, ji wê çêlnekirin ne mumkun bû. Xanî, pêxemberê me yê neteweyî, di sertaca edebîyata kurdî Mem û Zînê de navê Bateyî nehaniye. Wî, di van malikan de navê Eliyê Herîrî, Melayê Cizîrê û Feqiyê Teyran aniye û rûmeta berhem û afirandinên wan girtiye û gotiye ;

Min dê 'alema kelamê mewzûn
'Alî bikira li banê gerdûn
B'nave ruhê Melayê Cizîrî
Pê hey bikira 'Eliyê Herîrî
Keyfek we bida Feqiyê Teyran
Heta bi ebed bimayî heyran
Çib'kim ko qewî kesade bazar
Nînin ji qumaşî re xerîdar

Ne xwe, heke Bateyî berî Xanî jiyaba û mewlûdname nivîsîba, divabû Xanî jê çêl bikira. Yan na, ji XANÎ re dibû kêmasîyeke mezin. Dîtina ev celeb kêmasî û li milekî din jî aliyê Xanî de nezanîn pûtepênedan û nedîtina mewlûdnamê ne mûmkun e. Rastiyeke din jî heye, ku mewlûdname û toreya xwendin û dayîna mewlûdê derengtir ketiye nav civata kurdî. Ji ber vê yekê ye, ku mewlûdnameyên bi zaravayê kurdiya jêrîn û bi zaravayê kurdiya dimilî jî ne xwedi tarixeke hinde direj in. Ev yek jî wê baweriyê dide me, ku Mewlûda Kurmancî ne ji sedsala 15-an e. Lê heye ku ew piştî Xanî, yan jî çend sal berî mirina wî, ango ji destpêka sedsala 18-an be...

Mewlûda Kurmancî heya niha gelek caran hatiye çap kirin. Destnivîsara herî kevn ku me dîtiye, ji sala 1270-yê koçî, agno 1853-yê zayînî ye. Ew bi destê kesekî ku navê Wî Ebdulhemîd e, hatiye nivîsîn. Rojhelatnas Albert von Le Coq ew destnivîsar di sala 1901-2-an de li ∑amê bi dest xistîye û piştre ew aniye Ewropayê. Ew destnivîsar niha Ii kitêbxaneya "Staatsbibliothek" Marburg/Berlinê ye.

Cara pêşîn A. von Le Coq di sala 1903-an de Mewlûda Kurmancî li Berlînê çap dike. Ew ji ber destnivîsara Mela Mihemedê Wanî, ku ji sala 1888-an e, bi awakî fotolîtografik hatiye çap kirin. Bi dû re Ehmed Ramîzê Liceyê di sala (1324) 1906-an de li Qahîrê çap kiriye. Mewlûda Kurmancî disan di sala 1906 û 1919-an de li Stembolê, di 1933an de bi destê Celadet Bedirxan li ∑amê di (1350) 1931-an de li Stembolê, di 1966-an de bi destê Gîw Mukriyanî li Hewlêrê, di 1977 (?)-an de dîsan li Hewlêrê û di 1982-an de ji aliyê S.B. Amêdî de li Bexdayê hatiye çap kirin. Lê ev çap ji ya xwerû û orjinal cihêtir e. Mewlûdnameya Bateyî heya niha gelek caran li Kurdistana bakur foto-ofset, hatiye çap kirin. Lê bêî ku tarixa li ser bête guhartin û şaşiyên çapê bên rastkirin. Mewlûda Kurmancî di forma mesnewî de ye, ji 564 malikan û ji 18 beşan pêk hatiye. Malikên wê gişt ji 11 kîteyan pêk tên û kêşa wê li ser 11-an e. Rojhelatnas Wetzstein dibêje, ku "∑êx BATÊ yê Kurdan mewlûda *Îbn Hecer* bi helbestkî kiriye'kurdî". Lê di rastiyê de wî jê îlham wergirtiye, ne ku her yekser ew wergerandiye kurdî.
Destpêka Mewlûda Kurmancî weha ye ;

Hemdê bê hed bo Xudayê 'alemîn
Ew Xudayê daye me dînê mubîn

Dawiya wê jî weha ye :

Bo cemî'e muslimîn û salihe
Bo feqîrê Bateyî el-fatihe

Di dawiya her beşekê de ev neqarat heye;

Ger divêtin hûn ji narê bin necat
B'işq û şewqek hûn bibêjin es- selat

Gelek nivîsevan û lêger dinivisin û dibêjin ku ji bilî mewlûdnamê çend tiştên din yên Bateyî hene. Wek dîwaneke çîroka Zembîlfiroş, û hwd. Lê heya îro ji çend helbestên Bateyî û pê de çu tiştek bi dest neketiye. Heçî çîroka Zembîlfroş e, ew ne ya Bateyî ye. Lê ew ya Miradxwanê Beyazîdî ye.

BEŞ I

Namwer (Namuwer) *(f)* Xudannav, xwedînav

Mar û mûr	Mar ji bo heywanên dixuşin (rawir) û mûr jî ji bo bihukan ango rawir û bihuk.
Negotî	Eşkerenekirî, diyarnekiri, ji dev derneketî
Der *(f)*	Li, di... de, di nav de.
Karsaz (karisaz)	Kesê ku karekî bi rêk dixe û çêdike, çêker, xaliq
Bende	Kole, bendî, 'ebd
Mihriban *(f)*	Dilovan, bi şewqet, bi muhabet, rûxoş, xûynerm
Bedîd-Pedîd *(f)*	Pendî, eşkere, aşikar, berçav
Ba *(f)*	Bi
Aferîd	Afirand, xulq kir
Ala	Di kurmanciya nûjen de ev peyv wek AL hatiye nivîsîn û bi kar anîn. A rastî ne Al e, lê herwekî di zaravayê jêrîn de têt gotin, ALA ye. Ango; perçem, beyreq
Zeman	Dem, çax, wext
Aferîn	Bijî !

BEŞ II

An *(f)*	Bîsk, kêlîk, xêlek, lehze
Hin *(e)*	Bîsk, kêlîk, xêlek, lehze
Darû *(f)*	Derman
Dîde *(f)*	Çav
Bînahî	Hêza dîtinê, dîtin
Destegîr	Alîkar, destgîr, kesê ku bi destan digre
Gunehkar	Kesê ku gunehek kiriye
Penah *(f)*	Parêzgeh, star
Pûşt *(f)*	Pişt, piştevan
Rahnî	Ronahî, ronakî

Asîman, asûman, asîman *(f)* Asman,'ezman

Rewan, revan	Tiştê ku diçe, diherike; li vir: jîn
Xakî pa *(f)*	Xweliya pê, axa (toz) pê
Lew	Lewma, loma, ji ber vê/wê

Goşîdar, gûşdar *(f)* Guhdar

Karûbar	Kar û xebat
Xweşnewa *(f)*	Xeş, xweşdeng
Çerx	Daxdar
Daxîdar	Daxdar, birîndar

(f) : Ango bi farisî ye.

BEŞ III

Dergeh	Derî
Koh, Kûh	Çiya, şax, kirr
Fer	Teyîsok, îskok, birqok
Hember	Bergind, bergîdan
Bexşîn	Dayin, lê borîn
Dîger *(f)*	Yê/ya din
Hilbûn	Vêketin, pêketin (Çira hilbû = çira vêket, Agir hilbû = agir vêket, Agir hilkirin = agir dadan, agir vêxistin)
Hemnişîn	Pêkve rûniştî, hevrûniştî
Çavxirab	Çavneçê, çavpîs
Pur	Maneya rastî ya vê peyvê, herwek di zaravayê jêrin de tête bi kar anîn, tijî, dagirtî ye. Bi kurdî ne **pur** lê **pir** e. Li vir bi maneya gelek de ye.
Şiyan	Karîn, şekirin
Cergebez	Govenda ku jin û mêr bi hev re digrin, reşbelek. Wekî din maneya qelebalix jî dide.
Lêk	Li yek û du, li êk û du, ji hev, jê
Huşyar bûn	Hişyar bûn; li vir: agehdar bûn, haydar bûn.

AL AN ALA ?

Hin Kurdên Tirkiyê di van salên dawîn de ji bo **perçem** (tirkî: *bayrak*, fransizî: *drapeau*, îngilîzî: *flag*) peyva **al** bi kar tînin. Ev peyv xwerû kurdî ye û gelekî kevn e, lê rastiya wê **ala** ye, ne **al** e. Melayê Batê di Mewlûda kurmancî de ev gotin wilo bi kar aniye:

Ya Reb imanê dixwazin em mudam
Jêrê alaya Muhemed wesselam.

* * *

KEY Û KEVANÎ

Kurdên ku gotina **kevanî** yê nizanibin kêm in. Piranî ew bi mana jina malê, pîrek, xêzan an xanim bi kar tînin. Lê gelo ev gotin ji ku tê ? Ji peyva **Keybanû** , ango jina **key** (qiral, şah) tê. Mana gotinê qiraliçe, şahbanû, melîke (tirkî: *kraliçe*, fransizî: *reine*, îngilîzî: *queen*) ye. Pêşiyên me **ciwanmêr** (tirkî: *centlmen*, fransizî: *gentilhomme*, îngilîzî: *gentleman*) bûne, bi gotinê be jî, qedrê jin û xatûnên xwe zanibûne.

BIJÎ AN AFERÎN

Kîjan rastir e ? Her du jî. Aferîn ji **afirandinê** (xulq kirin, jiyandan) tê û xwerû kurdî ye, di farisî û zimanên îranî de teşeyên nêzîk ên vê gotinê hene. Jê **afirandî** (mexlûq, tirkî: *yaratık*, fransizî: *créature*, îngilîzî: *creature*) çêbûye. Mana aferîn bijî ye.

NAVÊN ÎDARÎ

kurdî	*tirkî*	*fransizî*	*îngilîzî*
Dewlet	devlet	état	state
Hukûmet	hükümet	gouvernement	government
Serekkomar	cumhurbaşkanı	président de la république	president of republic
Serekdewlet	devletbaşkanı	chef d'état	head of state
Sermiyan	başkan	président	president
Serekwezîr	başbakan	premier ministre	prime minister
Komar	cumhuriyet	république	republic
Key, şah, qiral	kral, şah	roi	king
Şahitî, keyîtî, qirali	şahlık, krallık	royaume, royauté	kingdom, kingship
Keyperest, şahperest	monarşist	royaliste, monarchiste	monarchist
Paytext	başşehir, başkent	capitale	capital
Wezaret, wezaretxane	bakanlık	ministère	ministry
Wezîr	bakan	ministre	minister, secretary
Wezareta dadiyê	adalet bakanlığı	ministère de la justice	ministry of justice
Wezareta karên derve	dışişleri bakanlığı	ministère des affaires étrangères	ministry of foreign affairs
Wezirê derve	dışişleri bakanı	ministre des affaires étrangères	foreign mininter
Wezareta karên civakî	sosyal işler bakanlığı	ministère des affaires sociales	ministry of social affairs
Civakî, sosyal	toplumsal	social	social
Wezareta karên çandiniyê	tarım işleri bakanlığı	ministère de l'agriculture	ministry of agriculture
Çandin	tarım	agriculture	agriculture
Cotkar	çiftçi	agriculteur	farmer
Wezareta bazara kar	çalışma bakanlığı	ministère du travail	ministry of labour
Bazara kar	iş piyasası	marché du travail	labour market
Wezareta maliyê	maliye bakanlığı	ministère des finances	ministry of finance
Sivîl	sivil	civile	civilian
Mal, xanî	ev, mesken	maison, logement	house, accomodation
Wezareta hawirparêziyê	çevre bakanlığı	ministère de l'environement	ministry of environemnt
Wezareta enerjiyê	enerji bakanlığı	ministère de l'énergie	ministry of energy
Hawîr, hawir	çevre	environement	environement
Wezareta bazirganiya derve	dış ticaret bakanlığı	ministère du commerce extérieur	ministry of foreign trade
Bazirganiya derve	dış ticaret	commerce extéhieur	foreign trade

Bazirganî	ticaret	commerce	trade
Bazirgan, têcir	tüccar	commerçant	trader, merchant
Wezareta aboriyê	ekonomi bakanlığı	ministère de l'économie	ministry of economy
Wezareta tendurustiyê	sağlık bakanlığı	ministère de la santé	ministry of health
Wezareta zanistî û teknolojiyê	bilim ve teknoloji bakanlıgı	ministère des sciences et de techonologie	ministry of sciences and techology
Wezareta budcê	bütçe bakanlığı	ministère du budget	ministry of budget
Wezareta tûrîzmê	turizm bakanlığı	ministère du tourisme	ministry of tourisme
Wezareta sporê	spor bakanlığı	ministère des sports	ministry of sports
Neteweyên Yekbûyî	Birleşmiş Milletler	Nations-Unies	United-Nations
Parlement	parlamento	parlement	parliament
Wezareta karên hundir	içişleri bakanlığı	ministère de l'interieur	ministry of domestic affairs
Wezareta şer	savaş bakanlığı	ministère de la guerre	ministry of war
Wezareta çandê	kültür bakanlığı	ministère de la culture	ministry of culture
Çandî	kültürel	culturel	cultural
Xwenda	okumuş	lettré, instruit	educated
Welat	ülke	pays	country
Navçe	bölge	région	area, region
Hêl, alî, rex, la	yer	côté	side
Dever, cîgeh	lokal	endroit, lieu, place	place
Cî, şûn, der	yer	lieu, place	place
Herêm	distrikt	district, secteur	district
Bajar, şehr	şehir	ville, cité	city, town
Tax	mahalle	quartier	quarter
Bajarok	küçük şehir, kasaba	bourg, bourgade	staggling village, small town
Gund, dêh	köy	village	village
Wîlayet	il	département, préfecture	department, province
Belediye, şaredarî	belediye	mairie	city hall, mayoralty
Şaredar, serekbelediye	belediye başkanı	maire	mayor
Bajaravahî	şehircilik	urbanisme	town planing
Walî	vali	préfêt	prefect, governor

NAVGÎNÊN NEQLIYÊ

kurdî	*tirkî*	*fransizî*	*îngilîzî*
trên	tren	train	train
balafir, firinde	uçak	avion	airplane, aircraft
otomobil	otomobil	automobile	motor car
otobus	otobüs	autobus	bus
minîbus	minibüs	minibus	minibus
kamyon	kamyon	camion	lorry, truck
kamyonet	kamyonet	camionette	van
traktor	traktör	tracteur	tractor
cîp	jip	jeep	jeep
pîkap	pikab	estafette	pick-up
bisîklet, duçerxe	bisiklet	bicyclette	bicycle
motorsîklet	motosiklet	motocyclette	bike
sêçerxe		tricycle	tricycle
parxêl	at arabası, kağnı	char à bœufs	oxcart
helikopter	helikopter	hélicoptère	helicopter
taksî	taksi	taxi	taxi
mototren	mototren	train diesel	motor train